# Zordariya navmalê

Ev cî alîkariyê dikin
Zordariya navmalê çi ye?
Alîkariya kesên zordarî pêk anîne
Zarok
Zordariya bi riya zayendî (cinsî)
Mafê mayînê (mafê rûniştinê)
Şopandin / tacîzkirin
Zewaca bi darê zorê û sinetkirina keçûjinan

# Ev cî alîkariyê dikin

Zordariya navmalê (Häusliche Gewalt) zordarî û şîdeta li nav malbatê yan li navbera hevjînan e. Xwestina alîkariyê ya di rewşa zordariya navmalê de, girîng e. Ciyên cihêreng agahdarî, şêwirmendî û alîkariyê dikin. Bi gelemperî bawerîdar û piranî belaş e û ger were xwestin wergerî jî tê kirin. Ciyên li jêr alîkariyê didin.

## Di rewşa lezgîn de

Li vê derê agahiyên din ên alîkariya di rewşên lezgîn de hene:

- Polîs: 112 / Ambulans: 144
- Parastin, şêwirmendî û bicîkirina ji bo jinên bi zarok û yên bê zarok: Mala jinan a her du Baselan (24/7), 061 681 66 33, www.frauenhaus-basel.ch
- Parastin, şêwirmendî û bicîkirina ji bo jinên bi zarok û yên bê zarok: Xanî ji bo jin û zarokan (24/7), 061 302 85 15, https://wohnen-frauen-kinder.heilsarmee.ch/ (DE)
- Alîkariya bijîjkî ya ji bo jinan: Klînîka jinan a nexweşxaneya zanîngehê ya rewşa lezgîn (24/7), 061 328 75 00, www.unispital-basel.ch/frauenklinik (DE)
- Alîkariya bijîjkî ya ji bo pitik, zarok û ciwanan: Nexweşxaneya zanîngehê û nexweşxaneya zarokan a her du Baselan a rewşa lezgîn (24/7), 061 704 12 12, www.ukbb.ch (DE)
- Alîkariya bijîjkî: Nexweşxaneya zanîngehê ya Baselê navenda rewşa lezgîn (24/7), 061 265 25 25, www.unispital-basel.ch/notfallzentrum (DE)
- Destwerdana (mudaxaleya) krîzan, alîkariya ji bo pirsgirêkên derûnî: Klînîkên derûnî yên zanîngehê yên Baselê ji bo rewşa lezgîn (24/7), 061 325 51 00, www.upk.ch (DE)

## Şêwirmendî

Bawerîdar û belaş e. Derfeta wergerandinê jî heye.

- Şêwirmendî, pêrebûn û alîkariya fînansî ya ji bo jin, mêr, zarok û ciwanan: Alîkariya qurbaniyan a li her du Baselan, 061 205 09 10, www.opferhilfe-beiderbasel.ch (DE)
- Destwerdan (mudaxaleya) krîzan û şêwirmendî: Xizmeta civakî ya polîsgeha kantonê (Ciyê beşa ji bo zordariya navmalê ya Polîsgeha kantonê), 061 267 70 38
- Şêwirmendiya ji bo pirsgirêkên alkol û kêşbûnê: Beşa birêvebiriya tenduristiyê, şaxê kêşiyê, 061 267 89 00, www.sucht.bs.ch (DE)
- Şêwirmendiya ji bo pirsgirêkên kêşbûnê ya bi zimanên cihêreng: Ciyê şêwirmendiya kêşiyê ya pirçandî MUSUB, 061 273 83 05, www.mituns.ch
- Şêwirmendiya bê nav (bi riya telefon, chat û e-mailê): Destê alîkariyê (24/7), Tel. 143, www.143.ch (DE)
- Alîkarî û şêwirmendî ji bo dêûbavan, malbatan û navbeynkarên têkildar: Banga lezgîn a dêûbavan (24/7), 0848 35 45 55 (tarîfa telefona malê), www.elternnotruf.ch (DE)
- Şêwirmendî ji bo mêrên li şîretan digerin: Buroya mêran a herêma Baselê, 061 691 02 02, www.mbrb.ch (DE) Heqdestê şêwirmendiyê li gor rewş û derfeta aborî ya kesên li şîretan digerin, tê guhertin.

## Zarok û ciwan

Zarok û ciwan ên pirsgirêkên giran ên malbatên wan hene, dikarin bi şev û roj li ba saziya Pro Juventute ji bo axavtinê serlêdanê bikin. Bi riya telefon, chat, peyamên telefonê yan e-mailê.

- Şêwirmendiya bê nav a ji bo zarok û ciwanan (bi riya telefonê, chatê, SMS û e-mailê): Pro Juventute: Şêwirmendiya bawerîdar û belaş 24saet/7 roj, Tel. 147, www.147.ch (DE)

## Alîkariya bijîjkî û ewlekirina delîlan/ewlekirina şopan

Ji bo zordariya bedenî û zordariya bi riya zayendî tê pêşniyarkirin, ku bi awayekî herî bi lez serî li sehkirina bijîjkî (mûayene) bidin. Sehkirin bawerîdar e. Tenê gava kesa, kesê êşiyaye, bixwaze, agahiyê didin polîsgehê.
Nexweşxaneya Zanîngeha Baselê ji bo êş, birîndarî û delîlên (şopên) zordariya bedenî yên zordariya bi riya zayendî ciyekî pisporiya vê beşê ye. Her kî bixwaze li ciyekî din serî li sehkirina bijîjkî bide, divê ji bijîjkan belgekirina bi hûrgulî ya delîlên (şopên) zordariyê bixwaze.

- Jin: Klînîka jinan a nexweşxaneya zanîngehê ya rewşa lezgîn (24/7), 061 328 75 00 www.unispital-basel.ch/frauenklinik, Spitalstrasse 21
- Mêr: Nexweşxaneya zanîngeha Baselê navenda rewşa lezgîn (24/7), 061 265 25 25 www.unispital-basel.ch/notfallzentrum
- Mûayenexaneya bijîjkên malê yan jî ciyê rewşa lezgîn ê nexweşxaneya herî nêz
- Alîkariya qurbaniyan a her du Baselan, 061 205 09 10, www.opferhilfe-beiderbasel.ch

## Şêwirmendiya kesên zordarî pêk anîne

Şêwirmendî bawerîdar e. Derfeta wergeriyê heye.

- Şêwirmendiya di rewşa pêkhatina zordariya navmalê de: Şêwirmendiya nakokiyên zordariya navmalê, 061 267 00 26, www.bdm.bs.ch (DE)
- Şêwirmendiya ji bo mêrên li şîretan digerin: Buroya mêran a herêma Baselê, 061 691 02 02, www.mbrb.ch (DE) Heqdestê şêwirmendiyê girêdayî rewş û derfetên aborî yên kesên li şîretan digerin e.

## Ciyên din ên stendina alîkariyê

Li ser malpera «Zordariyê rawestîne» (Halt Gewalt) li hember zordariya navmalê lîsteya ciyên din ên karibin alîkariyê bidin heye. Wek mînak ji bo pirsên ji beşa koçberiyê, şêwirmendiya kêşbûnê, şêwirmendiya hiqûqî yan jî şêwirmendiya rewşên giran ên malbatî.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/ev-ci-alikariye-dikin

# Zordariya navmalê çi ye?

Zordariya navmalê (Häusliche Gewalt) zordariya di nav malbatê de yan di navbera hevjînan de ye. Ew bedenî û ruhî diêşîne. Gelek cureyên zordariya navmalê hene. Zordariya navmalê li Swîsreyê qedexe ye.

## Zordariya navmalê çi ye?

Zordariya navmalê zordariya di nav malbatê de yan di navbera hevjînan de ye: Li navbera hevjînên zewicî yan li navbera kesên bi hev re dijîn an jiyane. Ev ne girêdayî ye, bê hûn niha bi hev re dijîn. Lê belê zordariya di navbera dêûbav û zarokan de yan di navbera xwişkûbirayan de jî zordariya navmalê ye.
Zordariya navmalê dikare nexweşiyên derûnî û psîkosomatîk (bandora zîhnî ya li ser bedenê) bi xwe re bîne. Zordariya navmalê bi taybetî pêşdeçûna tenduristî û civakî ya zarokan dixe nav xetareyê. Zarokên bi awayekî nerasterast li rastî zordariya navmalê tên jî ji vê bandor dibin.

## Bandor li ser kê dibe?

Bandora zordariya navmalê dikare li ser hemû mirovan bibe: mirovên ciwan û kalûpîr, kesên bi nasname yan bê nasnameya Swîsrî, malbatên dewlemend û yên feqîr. Li Swîsreyê gelek mirov dibin mexdûrê zordariya di nav malbatê de yan hevjînên (demeke berê) xwe. Stendina alîkariyê ya kesên bibandorbûyî, girîng e.

## Awayên cihêreng

Awayên cihêreng ên zordariya navmalê hene: Zordariya bedenî, derûnî, zayendî û aborî. Bi piranî awayên cihêreng ên zordariyan di heman demê de tên.
Wek mînak: Erzşikandina berdewamî, hakareta domdar, qedexekirina têkiliyan, asêkirina di hundir de, dehfdan, kontrolkirin, zorlêkirina nav nivînê, jêstendina pereyan, qedexekirina hînbûna zimanekî, guhnedana zarokan, îhmalkarî. Gef û çavtirsandin jî zordariyên nav malê ne.

## Zordariya nav malê qedexe ye

Zordariya navmalê qedexe ye. Kesên zordariyê dikin wê werin darezandin. Gava polîs bi zordariya navmalê bihise, divê lêpirsînê bike. Ger kesên li rastî zordariyê hatine nexwazin jî, divê ew lê bikole.

## Şêwirmendiya bi riya Saziya Alîkariya Qurbaniyan

Saziya Alîkariya Qurbaniyan/Mexdûran (Opferhilfe) şêwirmendî û agahdariyê dide kesên di nav malbatê de yan di dema hevjîniyê (berê jî) de li rastî zordariyê hatine. Ev alîkarî belaş e. Bi kesên pisporên beşê re bi hev re, mirov dikare gavên piştre werin plan bike.
Xebatkarên vê saziyê sûndxwarî ne. Ev tê wê wateyê, ku ew li ser axavtina we nikarin agahiyan bidin ti kesên din. Heta nikarin bidin polîsan jî.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/zordariya-navmale-ci-ye

# Alîkariya kesên zordarî pêk anîne

Kî bi awayê bedenî û ruhî êşê bide, divê ew berpirsyariyê bigire ser xwe û alîkariyê bistîne. Mirov dikare bi tevlêbûna şêwirmendiyan hînî guhertina liv û tevgerên xwe bibe.

## Ezê alîkariyê li ku bibînim?

Mirov di bernameya hînbûna li hember zordariya navmalê de hîn dibe, nakokiyan bê zordarî çareser bike. Ev derfet ji bo mezinan e. Derfeta wergeriyê jî heye. Serlêdan dikare li ser jimara 061 267 44 90 an jî e-maila haeusliche-gewalt@jsd.bs.ch were kirin. Tevlêbûn belaş e.
Derfetên din ên alîkariyê:

- Şêwirmendiya nakokiyên zordariya navmalê, 061 267 00 26, www.bdm.bs.ch (DE)
- Buroya mêran a herêma Baselê, 061 691 02 02, www.mbrb.ch (DE) Heqdestê şêwirmendiyê girêdayî rewş û derfetên aborî yên kesên li şîretan digerin e.

Pêdiviya kê bi axavtina lezgîn hebe, ew dikare têkiliyê bi saziya Destê Alîkariyê (Dargebotene Hand) re deyne (Telefon, peyama nivîskî, chat, mail). Hema her gavê hin kes li wir hene. Bi şevê jî hene. Mirov dikare bê gotina navê xwe jî serlêdanê bike (anonim-veşartî).

- Destê Alîkariyê (24/7), 143, www.143.ch (DE)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/alikariya-kesen-zordari-pek-anine

# Zarok

Zarokên li malê li rastî zordariyê tên, hewceyî alîkariyê ne.

## Zordariya navmalê li ser zarokan şopên xwe dihêle

Gava zarok li malê li rastî zordariya navmalê tên, ev yek li ser pêşveçûna wan bandorên neyînî dike. Ev yek gava zordarî rasterast li zarokê neyê kirin jî bandorê dihêle.
Hin zarok êşê bêdeng dikişînin, yên din diyardeyên cihêreng nîşan didin. Wek mînak: Zehmetiyên li xwendegehê, şilkirina bin xwe/nivîna xwe, serêşî, xerabûna awayê xwarin an xewê, pirsgirêkên danûstendina bi zarokên din re yan jî hêrsbûn/êrîşkarî.

## Ev cî alîkariya zarokan dikin

Alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) şêwirmendiya zarok û ciwanan dike, gava ew li rastî vê zordariya navmalê werin. Li vir agahiyên zêdetir ên alîkariya qurbaniyan hene.
Xizmeta zarok û ciwanan KJD (Kinder- und Jugenddienst KJD) ya beşa birêvebiriya perwerdehiyê bi pêşvebirineke tendurist alîkariya zarok û ciwanan dike. Zarok û ciwan li wê derê alîkariyê dibînin, wek mînak ji bo nakokiyên malbatî.

## Zarok dikarin çi bikin?

Ji bo zarokên li malê li rastî zordariyê tên, girîng e, bi keseke/ bi kesekî ji derveyî malbatê re li ser vê yekê were axavtin. Wek mînak: Mamoste, xebatkarên civakî yên xwendegehê, dêûbavên hevalan an jî cîran.
Mirov dikare bi şev û roj telefonî saziya Pro Juventute bike. Kesên li wir kar dikin, axavtina we ji ti kesên din re nabêjin. Ewê li we guhdarî bikin û di lêgerîna çareseriyan de alîkariya we bikin. Telefonkirina Pro Juventute belaş e. Naxwaze li wir nav were gotin. Mirov dikare bi riya SMS, chat û mailê jî xwe bigihîne Pro Juventute.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/zarok

# Zordariya bi riya zayendî (cinsî)

Êrîşkariya zayendî (êrîşkariya cinsî) di nav hevjînan (yên berê jî) û malbatê de jî heye. Zordariya bi riya zayendî cureyekî zordariya navmalê ye. Ew dikare ji polîsgehê re were gilîkirin. Ger mirov nexwaze gilî li ba polîsgehê bike jî: Girîng e, hema piştî êrîşkariyê bi lez û bez sehkirina bijîjkî bixwaze.

## Alîkariya bijîjkî

Klînîka jinan an jî navenda rewşa lezgîn a nexweşxaneya zanîngeha Baselê sehkirinên bawerîdar bi van riyên li jêr bi rê ve dibin:

- Bijîjk ti kesî agahdar nakin.
- Zordarî wê were belgekirin. Şop (delîl) wê salekê werin parastin.
- Belge dikarin piştre bidin polîsgehê. Belge delîlên girîng in.
- Bijîjk dikare têkiliyê bi saziya alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) re çêke.

## Dema di navbera zordarî û sehkirinê de

- Serê xwe û laşê xwe neşon – destên xwe jî neşon.
- Ger derfet hebe neçin destavê jî.
- Cilan (kincan) neşon, ji bo mûayeneyê bi xwe re bînin.

## Şêwirmendiya hiqûqî û derûnî

Alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) dikare alîkariya derûnî bide. Ew bersivên gelek pirsan dizanin. Hûnê li wir alîkariyê bibînin.

## Gilîkirina li ba polîsgehê

Tecrubeya polîsan li ser gilînameyên ji ber zordariya bi riya zayendî heye. Lêpirsîn wê ji aliyê keseke/kesekî heman zayendê ve were birêvebirin. Gilîname dikare ji polîsgehê re jî were şandin an ragihandin. Mirov dikare keseke/kesekî bawerîdar an yek ji pisporên beşê yên ji saziya alîkariya qurbaniyan bi xwe re bibe.
Mirov di kêliyên derveyî demên vekirîbûnê de bi riya telefona banga lezgîn 117 an 112 xwe digihîne polîsgehê.
Xizmeta Civakî ya Polîsgeha Kantonê pisporê zordariya navmalê û awayê zayendî ye:

- Xizmeta Civakî ya Polîsgeha Kantonê: 061 267 70 38 (di demên vekirîbûna buroyê de)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/zordariya-bi-riya-zayendi--cinsi

# Mafê mayînê (mafê rûniştinê)

Xwestina şêwirmendiya rû bi rû girîng e. Axavtineke bi saziya alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) re ti carî nabe sedema jidestçûna mafê mayînê. Axavtin bawerîdar e. Alîkariya qurbaniyan agahiyê nade ti kesî.

## Mafê mayînê, di rewşa cihêbûna ji ber zordariya navmalê de

Ger kesek bi riya zewacê li Swîsreyê bi cî bûbe û lê belê li rastî zordariya navmalê were, ew li gor rewşê, piştî cihêbûnê jî dikare li Swîsreyê bimîne. Her rewşek cuda ye. Ji ber vê yekê xwestina şêwirmendiyê girîng e.
Saziya alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) dikare alîkariyê bike: Keseke pispor/kesekî pispor rewşa zagonî ya heye vedibêje û alîkariya kesên têkildar di gavên wan ên pêş de dike. Şêwirmendî belaş û bawerîdar e. Derfeta wergeriyê jî heye.

## Belgekirina zordariyê

Hebûna delîlên zordariyê girîng e. Wek mînak: Wêneyên birîndariyê, qeyda geflêxwarin an destdirêjiya devkî (tacîza bi gotinan) ya li ser ekranê WhatsApp an facebookê û hwv. Divê delîl li ciyekî saxlem werin parastin. Wek mînak, li ba keseke ji derdora xwe ya hevalan yan li ciyê kar û xebatê.
Her wiha baş e, ku hin kesên ji derdorê jî li ser zordariyê agahdar bin. Wek mînak, kesek ji nav nas û dostan, ji ciyê kar, ji nav cîranan an ji derdora xwendegehê.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/mafe-mayine--mafe-runistine

# Şopandin / tacîzkirin

Şopandin / tacîzkirin cureyekî zordariyê ye û barê wê pir giran e. Axavtina li ser wê û xwestina şêwirmendiyê girîng e.

## Şopandin / tacîz çi ye?

Wateya şopandinê / tacîzê çavdêrîkirin, têkilîdanîn, şopandin, bipeyketin û acizkirina kesekê/kesekî ya zêde caran bi domdarî ye. Ev li dijî vîna kesa/kesê tê şopandin/ tê tacîzkirin e. Kesên sûcdar bi piranî kesên ji derdorê (hevjînê berê, hevjîna berê) ne lê belê kesên nenas in jî.
Wek mînak: Gelek caran şandina SMSan, mailan û peyamên din, libendemayîna li ciyê kar an li ber malê bi awayê kemîndanînê, acizkirina li ser telefonê, şandina diyariyên nayên xwestin, pirskirinên li derdora wê kesê/wî kesî.
Şopandin (tacîzkirin-Stalking) dikare xisarên bedenî û derînî bide tenduristiya qurbaniyan.

## Belgekirina zordariyê

Komkirina delîlên şopandinê / tacîzê girîng e. Wek mînak rojnivîsekê li ser her yek tacîzkirin/şopandina livûtevgerên tên kirin, binivîsin (wek mînak, çi diyarî, kaxez, telefonkirin hatine), derdorê haydar û agahdar bikin (cîran, heval û nas, karsaz) û qeyda ekranê/wêneyê ekranê yê peyaman (ji WhatsApp, Facebook, û hwv.) bigirin.

## Lêgerîna alîkariyê

Saziya alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) dikare alîkariyê bide. Kesek ji beşê dikare rewşa hiqûqî rave bike û di gavên wan ên pêşdetir de alîkariya kesên têkildar bike.
Saziya xizmeta civakî (Sozialdienst) ya polîsgeha kantonê pisporê şopandinê/tacîzkirinê ye. Kesên têkildar dikarin serî li saziya xizmeta civakî bidin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/sopandin--tacizkirin

# Zewaca bi darê zorê û sinetkirina keçûjinan

Zewaca bi darêzorê (Zwangsheirat) û sineta keçûjinan (Mädchenbeschneidung) li Swîsreyê qedexe ye. Li kêleka ciyên pisporên beşa xwe, saziya alîkariya qurbaniyan jî alîkariya we dike.

## Zewaca bi darêzorê çi ye?

Ger kesek bi zorlêkirina malbatê û ne bi dilxwaziya wê/wî bixwaze were zewicandin, ev yek zewaca bi darêzorê ye. Zewac dikare bi fermî were betalkirin. Mirov jî dikarin hilbijêrin, bê dixwazin zewicî bimînin an ji hev veqetin. Ger tevî nexwestina xwe jî wek hevjîn bimînin, wê demê jî mirov dibêje, hevjîniya bi darêzorê.
Hin mînakên ji bo bi darêzorê: Geflêxwarin, guvajtin/şantaj, zorlêkirina derûnî an zordariya bedenî.
Zewac û hevjîniya bi darêzorê li Swîsreyê qedexe ne.

## Alîkarî

Ciyê beşa netewî zwangsheirat.ch şêwirmendiya kesên têkildar dike û kesên pispor bi awayekî bawerîdar û belaş xizmetê didin: Xeta hawarê 0800 800 007 / info@zwangsheirat.ch

## Sinetkirina keçûjinan çi ye?

Di sinetkirina keçûjinan de lebata zayendî ya keç an jinan tê birîn. Gelek cure û pratîkên sinetkirinê hene. Gelek keç û jinên tên sinetkirin bi awayê tenduristî û ruhî heta piştî jêkirinê jî êşê dikişînin.
Sinetkirina keçûjinan qedexe ye. Ger dêûbav sinetkirina zarokên xwe li derveyî Swîsreyê birêxistin bikin jî, ew xwe dixin rewşeke werin cezakirinê.

## Alîkarî

Tevna li dijî sinetkirina keçûjinan agahdariyan dide û bi kesên sereke re têkiliyan çêdike.
Karîtasa Swîsreyê bi awayekî belaş û bawerîdar şêwirmendiya malbatên têkildar dike: 042 419 23 55 / beratung@maedchenbeschneidung.ch
Saziya alîkariya qurbaniyan (Opferhilfe) jî dikare alîkariyê bide.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/zordariya-navmale/zewaca-bi-dare-zore-u-sinetkirina-kecujinan